Konferansa III'yemîn: 14—16ê avrelê 2017, Hamburg

Meydanxwestin ji Mondernîteya Kapîtalîst re III:

Aşkerekirina Modernîteya Demokratîk - Berxwedan, Serî hildan û Afirandina Nûbûnê

Banga Gotarxwestinê

Kapîtalîzm di nav krîzeke binyadî de asê bûye û -her ku tê gotin alternatîf nîne jî- di tevaya cîhanê de meşrûbûna xwe wenda dike. Di heman demê de tevgerMîrn rastgir û paşverû jî xwe wekî alternatîf nîşan didin.

Lê belê ji bilî alternatîfên li holê riyên din jî pêkan in. Li Rojava/Bakurê Surî bi pejirandina hêlekê re derxistina "riyeke sêyemîn" pêkan bû. Avakirina pergaleke dijpederşahî û nîzameke aborî ya demokratîk di dûrahiyeke bidestxistinê de ye û xwedî derfetek e dikare her û her xwe ji nû ve saz bike.

Riyên sêyemîn ên bi vî rengî di hemû cîhanê de pêkan e. Em dixwazin di konferansa xwe ya sêyemîn de van tiştan bi we re parve bikin, hev du agahdar bikin, lêkolîn û nîqaş bikin.

Konferansa me ya sêyemîn bi navê "Meydanxwestin ji Mondernîteya Kapîtalîst re III: Aşkerekirina Modernîteya Demokratîk - Berxwedan, Serî hildan û Afirandina Nûbûnê" di cejna Paskalyayê de (14-16ê avrelê) li Hamburga Almanyayê dê bê lidarxistin.

Her du konferansên berê ne bes întellektuwelên bijarte, di heman demê de çalakvan û akademîsyenên ciwan jî anî cem hev ve derfet da wan ku fikrên xwe pêşkêş bikin. Di vê konferansa sêyemîn de, di navbera van hemû derdor û tevgeran de di asta Kurdistan û Cîhanê de me piran ava kirin, em dixwazim ev avakirin berdewam be.

Di vê çarçoveyê de, em hêvî dikin ku hûn cardin bersiv bidin vê "Banga Gotarxwestinê" ku ji çar mijaran pêk tê. Lêkolînerên ku gotarên wan hatine pejirandin, ji bo ku gotarên xwe pêşkêş bikin dê bêne vexwendin.

1 — Secerenasiya Dewletê

Şêweyên dewlet û îqtîdarê bi demê re veguheriye. Pederşahî, ol, neteweperestî, mîlîtarîzm û zanistxwazî çawa bûne zirxên dewlet û civakên çîndar? Têkiliya vê yekê bi azadî û bi nebûna azadiyê re çi ye?

2 — Feylesofiya Dîrokê

Öcalan diyar dike ku dîrok bi esasî di navbera şaristaniya dewletê û civakên berîdewletê yên gundî-çandî dîroka hewldanan e. Di heman demê de di avakirina civaka azad de gelek girîngî dide hişmendiya dîrokê. Di vê çarçoveyê de çawanêrîna me li ser dîrokê çima girîng e?

3 — Civaka Exlaqî û Polîtîk

Öcalan, analîza xwe ya şaristaniyê û modela modernîteya demokratîk dispêre "civaka exlaqî û polîtîk". Ev hêman serekxala modelê ye, têkiliya vê argûmentê bi azadiyê re bi çi hawî ye? Ev analîz Marksîzm û ekolên din ên fikrî çawa pênase dike ango bi çi hawî ji wan cuda dibe?

4 — Aborîya Ekolojîk, bajar û çolterî

Öcalan, balê dikşîne li ser dijminahiya bajaran ku li jiyanê ferz dikin û vîzyona gundên ekolojîk pêş ve dibe. Divê bi veguherîneke ekolojîk î kûr, pirsên li ser têkiliya di navbera bajar û çolteran bêne nirxandin. Di şewqa pêşniyaza/angaşta konfederalîzma demokratîk de divê têkiliya di navbera bajar û çolteran de çawa be.

This document on the web: http://networkaq.net/2017/KU_Banga Gotarxwestine 2017.pdf

Derbarê Şandina Gotaran de Agahiyên Teknîkî

- Deqên gotarê divê nêzî 1500 peyv be, ji 2000an derbas nebe.
- Kurteyên gotarê ne zêdeyî 300 peyvan divê heya 15.01.2017ê bêne şandin.
- Ji bo ku rewşa dawî ya gotaran bêne nirxandin, deq dawî di 10.03.2017 de bê şandin.
- Lîsteya gotarvanên konferansê dê di 20.03.2017 de bê daxûyandin.
- ji bo ragihandinê navnîşana e-mailê: cfp@networkaq.net

Navnîşana ji bo têkiliyê

cfp@networkaq.net

Network for an Alternative Quest: Însîyatîfa Navneteweyî ya "Ji bo Öcalan Azadî–Ji bo Kurdistanê Aşitî" • KURD-AKAD – Tora Akademîsyenên Kurd • YXK – Yekîtîya Xwendekarên Kurdistanê • Kovara Kurdistan Report • ISKU – Informationsstelle Kurdistan e.V. • Cenî – Buroya Aştîyê ya Jinên Kurd • Civaka Azad – Kurdisches Zentrum für Öffentlichkeitsarbeit